

Behîv



Dema ez van rêzikan dinivîsim, kitûmatên darên behîvan li dêwr û berên Duhokê bişkivîne. Dema hûn van rêzan dixwînin hemû darên behîvan yê dibîşkivîn û bi bişkivîna wan buhar yek ji ciwan-tirîn dîmenên sirûştî pêşkêşî me dike.

Pîştî demekê kurt ew kullîk dê bine behîvterk û dar jî hêdî hêdî dê kesk blin.

Behîv dareka dêmî ye anku nahête avdan û li nav rezan dihête çandin.

Koka dara behîvê vedigere Tirkistan, Îran, Kurdîstan û rojhelata nêzîk ku wek dareka kîvî li wêrî şînbûye, paşî hatî ye kehî kirin û niha li gelek welatan dihête çandin bi taybetî li başûrê Ewrûpa, frensa, Mexribê, Kalîfornîya (Emerîka) û Avustralîya. Nêzîkî 750 cûrên behîvan hene ku dabeş dibine ser du cînên serekî: Behîva şîrîn û behîva tal.

Dara behîvê ji 5 heta 10 mêtiran bilind dibe û vê darê pêwîstî bi buhareka bê siru xwîsarû gijloke da ku kullîka wê pûç nebît.

Dara behîvî li gor keşubayê ew welatê lê şîrîn dibe di navbera kanûna mezin heta nîsanê dibîşkive û kullîkan dide.





Bahra pitir behîv li nav rezên tirî û darên zeytûnan dihête çandin. Belgê dara behîvê yê zirav û dirêj e. Kulîka wê ji pênc belgan pêk dihêt û hindek spî ne û hindek di pîvazî ne. Baqofka wê wek baqofka xwexê ya kesk û bi pîrte. Piştî hişk dibe ew tîvîê kesk hişk dibe û yê di binive req dibe û kakilkê diparêze.



Welatên Navdar Bi Berhem-hênana Behîvan:

Emeîka (kalkîforîniya)	(000 30)	ten salane
Îtaliya	(000 25)	ten salane
Spaniya	(000 20)	ten salane
Mexrib	(000 6)	ten salane
Purtuqal	(000 4)	ten salane
Firensa	(000 2)	ten salane



Ji behîvê sabûneka gelek bihagiran, zeyt, kîrêm û cûrekê şîrî jî dihêne çê kirin.



Pêkhata behîvê:

Av	30 %
Sîfîroz	3-5 %
Lignîn	5/3-5%
Pirofîn	20-25 %
Zeyit	35-50 %
Şekir	5-6 %
Ratic	3 %
Tîrşafî	5/0 %

